# Kovara *Kurdistan*

**SEÎD VEROJ (www.nefel.com)**

Digel kovara *Jîn*ê, kovara *Kurdistan* jî, ji alîyê **Komeleya Pêşketina Kurdistanê** ve hatîye çapkirin û belavkirin. Yekemîn hejmara kovara *Kurdistan*ê, di roja 30ê Kanûna Paşîn a 1919 (30 Kanun-î Sanî 1335) de di çapxaneya Necmî Îstiqlal de hatîye çapkirin. Li gor derçûna dîroka hejmara yekê, bi derbasbûna vê salê re li ser roja çapbûna Kurdistanê 95 sal derbas dibin. Ev kovar, kovareke hefteyî bû, tê de nivîsên bi zimanê osmanî, kurdî, farisî û erebî hatine belavkirin. Ciyê çapkirina wê, bajarê Îstenbulê ye. Mehmed Mîhrî xwedîyê îmtiyaz û Arwasîzade Mehmed Şefîq jî sernûserê kovara *Kurdistan*ê bûn.

Îro em baş nizanin ku ev kovar li ser hev çend hejmar hatine çapkirin. Der bareyê hejmarên derçûyî yên kovara *Kurdistan*ê de bîrûrayên ciyawaz hene. Di nav rûpelên gelek hejmarên kovara *Jîn*ê de nûçe û danasîna hejmara nû ya kovara *Kurdistan*ê hatîye belavkirin. Di hejmara 25. ya *Jîn*ê de agadarîya çapbûna hejmara 14. ya kovara *Kurdistan*ê[1] hatîye belavkirin. Li gor agadarîya Memed Bayrak ku ji raporek Hasîp Koylan neqil dike û têde behsa hejmara 15. ya kovarê û nivîseke Mehmed Mîhrî ya bi navê "*Kürtlerin Hissiyat-ı Necibesi*"[2] dike. Li gor nivîsîn û neqilkirina Dr. Ferhad Pîrbal, "Mamoste Eladîn Sicadî û Kemal Xeznedar li ser ew bawerîyê ne ku kovara *Kurdistan* 27 hejmar hatine belavkirin. Lêbelê ji bo rastnîşandana vê îddîayê, ji hejmara paşîn rûpelek tenê jî li berdest nîne. Mamoste Kemal Mazhar jî dibêje: "Hejmara dawî ya ku min dîye, hejmara 19. ye û li ser bergê wî hatîye nivîsîn; 7ê Receba 1338 (1920) û sala duwemîn."[3] Viladimir Minorsky jî dibêje: "Kovara *Kurdistan* a heftane, li ser hev 37 hejmar hatine çapkirin."[4] Lê tu çavkanîyek jî dîyar nake.

Di vê xebata berdest de hunê naveroka hejmarên **1, 2, 3, 4, 5, 6, 8, 9** û **13** yên kovara *Kurdistan*ê bibînin. Hejmarên din li ber destê min nîn in. Li ser bergê pêşîn ê hejmara yekemîn weha hatîye lêkirin: "Ji dervayê sîyasetê behsê her babetê tête kirin, bi her zimanî tête çapkirin û kovareke hefteyî ye."[5] Der barê ciyê neşirkirinê jî weha hatîye lêkirin: "Di çapxaneya Necmî Îstiqbal de hatîye çapkirin." Di hejmarên 5-6an de em dibînin ku pênaseya jorîn guherîye û li şûna wê de weha hatîye lêkirin: "Sîyasî, civakî, edebî û îlmî ye, ji hefteyê carek tête neşirkirin." Li ser bergê hejmarên 8. û 9. jî weha hatîye lêkirin: "Kovareke fikrî û serbixwe ya sîyasî, civakî, edebî û îlmî ye, ji hefteyê carek tête neşirkirin." Wek ciyê belavkirinê jî navnîşana "Îstanbul Bab-ı Ali caddesinde Yeni Şark Kütüphanesi" hatîye dîyarkirin. Di hejmara yekemîn a kovara *Kurdistan*ê de, bi navên cihê cihê pênc nivîsên M. Mîhrî hatine çapkirin.

Herwekî ku me li jorê jî behs kir, di hejmara yekemîn a kovarê de sîyaset, li dervayê mijûlayî û xebata kovarê bête nîşandan jî, di hejmarên paş wê re pênaseya kovarê diguhare û sîyasîbûna kovarê jî tête dîyarkirin. Dema ku kovar di çarçoveya armanceke sîyasî de weşana xwe bike, ev armanca sîyasî, bêguman wê bi armanca sîyasî û neteweyî ya Komeleya Tealî ya Kurdistanê ve têkildar be. Di vê çarçoveyê de dema ku armanca sîyasî ya Komelê, naverok û munaqeşeyên

---

[1] *Jîn*, h.: 25, wergera M. Emîn Bozarslan, Cild: V, Weşanxana Deng, Sweden, 1988

[2] Mehmet Bayrak, *Kürtler ve ulusal-demokratik mücadeleleri*, weşanên Özge, 1993, Ankara, r. 96

[3] Dr. Ferhad Pîrbal, Kovara *Kurdistan* (1919-1920), Hewlêr, 1998

[4] Viladimir Minorsky & Thomas Bois, *Kürt Milliyetçiliği (Netewetîya Kurdan)*, Örgün Yayınevi, Îstenbul, 2008, r. 202

[5] b.n. kovara Kuristan h.: 1, 30ê Kanuna 1919, Îstenbul

nivîsên di nav rûpelên kovarê de bêne nirixandin, dîyar dibe ku ji bo belavkirin û pêşxistine fikra netewîya kurd, kovara *Kurdistan* bûye wasîteyek pirr girîng. Ev taybetîya kovarê yanî weşan û xeta wê ya neteweyî, bala wezîfedar û hêzên navdewletî jî dikşîne û di raporteke (FO 371/4191, 10ê Temmuza 1919) serbazê îngilîzî C. L. Woolley de, hatîye dîyarkirin ku "kovara *Kurdistan*, weşaneke netewî ya heftane ye."[6]

Bêguman dema ku babet li ser kovar û rojnameyên kurdî be, çapemenî û weşangerîya kurdî be, nûqteyek girîng jî ragehandin û belavkirina wan e. Hinek nimûneyên pirr hindik ne tê de, wê demê pirranîya weşanên kurd li dervayê sînorên Kurdistanê hatine çapkirin. Ji ber vê yekê belavkirina wan a di nav rewşenbîr û xwendevanan de, problemek bingehîn ê xebatê bû. Em dizanin ku ji rojnameya *Kurdistan* a Mîqad Mîdhat Bedirxan bigre hetanî kovara *Kurdistan*, ji dema Osmanîyan bigre heta dewra komara nû ya Turkiyê û di pey wê re jî ku çiqas weşanên kurdî hatine çapkirin, bêîstisna ji alîyê desthilatdarîya sîyasî ya wê demê ve zixtên polîsîye li ser wan û xwendevanên wan hatine kirin, li hemberê belavkirinê jî astengî û tengasîyên îdarî, sîyasî û ewlekarî hatine çêkirin. Bi tevî hemû astengîyan, em dibînin ku kovara *Kurdistan* di gelek bajarên Kurdistanê de gehiştîye ber destê xwendevanan û ji aliyê xwendevanan ve têlgiraf û nameyên pîrozbahî ji bo kovarê hatine rêkirin. Dema em bala xwe bidin nav rûpelên hejmara pêncan (5), em dibînin ku ji bajarên wekî Diyarbekir, Elazîz, Mazgirda Dêrsim û Wêranşarê ve têlgirafên pîrozbahî ji bo navenda kovarê hatine rêkirin. Ev yek jî dîyar dike ku Komeleya Pêşketina Kurdistanê li gelek bajaran rêxistina xwe çêkirîye û kovara *Kurdistan*ê jî bi rêya vê komelê hatîye belavkirin.

Di serrûpelê kovara *Kurdistan*ê de hatîye lêkirin ku "Ji dervayê sîyasetê behsê her babetê tête kirin". Lê belê di naverokê de sîyaset jî tê de, li ser gelek babetên cûda nivîsên cûr bi cûr hatine belavkirin. Dema mirov bala xwe bide nivîskarên kovarê, em dibînin ku navê gelek nivîskar û kadirên pêşhatî û namdarên wê demê têde derbas dibin. Ji nav nivîskarên kovarê, divê pêşîyê navê xwedîyê kovarê Mehmed Mîhrî bête bilêvkirin ku wî ne tenê bi navê xwe, bi mahlasên Mehmed, Mîhrî, M. Mîhrî, M. M. û Kake Heme nivîsandîye. Sernivîskarê kovarê Arwasîzade Mehmed Şefîq jî, bi navên A. Mehmed Şefîq û Mehmed Şefîq nivîsandîye. Digel nivîsên wan, nivîsên Abdullah Cevdet, Rehmîyê Hekkarî, Kemal Fewzî, Abdulwahîd, Ahmed Wehbî, Ahmed Arif, Qadîzade M. Şewqî, E. Q., M. Selîm Begî, Emîn Fewzî, Cano, Mehmed Osman, M. Yamulkîzade, Îbn el Reşîd, Lawê Delal û Sabrî Suleyman di nav rûpelên hejmarên kovarên bedrdest de hatine çapkirin. 29.12.2014

## Nivîsên serrûpel û têdeyî yên hejmarên berdest ên kovara *Kurdistan*ê

### Kurdistan, hejmar: 1

Sala yekemîn/Birinci sene, 30 Kanûna Sanî 1335/ 30ê Kanûna Paşîn 1919
Salek 200, 6 mang 120, 3 mang 70 quruşan e.
Seneliği 200, 6 aylığı 120, 3 aylığı 70 kuruştur.
Siyasi dışında her konu mevzubahistir ve her dil ile haftada bir defa neşrolunur mecmuadır.
(Ji dervayê sîyasetê behsê her babetê tête kirin. Kovareke hefteyî ye û bi her zimanî tête çapkirin).

[6] Ahmet Mesut, İngiliz Belgelerinde Kurdistan (1918-1958), weşanên Doz, Îstenbul, 1991,r. 54

**Têdeyî/Mûnderecat**

| Nivîs | Nivîskar | Ziman |
|---|---|---|
| Mûlahaza (Raman) | A.Mehmed Şefîq | Kurdî |
| İlim ve ûlemanın gaye ve hedefi | Mehmed Mîhrî | Turkî |
| Nereye gideceksin? | Abdullah Cevdet | Turkî |
| Kürd edebiyatından bazı örnekler | Mehmed | Kurdî-Turkî |
| Baskı ve gelişim | Hakkarili Rahmi | Turkî |
| Sevgi ve muhabbet selamı Kurdistan tepe ve dağlarına olsun | Mîhrî | Turkî |
| Müsemmasız isimler ve İsimsiz müsemmalar | M. M. | Turkî |
| Îrfan: Kürdçe, Türkçe, Arapça, Farsça ve Fransızca lûgat | M. M. | Turkî |

Nushası 5 kuruştur. /Nusxa wê 5 quruşan e.
Necmî İstikbal Matbaası

## Kurdistan, hejmar: 2

Sala yekemîn/Birinci sene, 9 Kanûna Sanî 1335/ 9ê Sibata 1919
Salek 200, 6 mang 120, 3 mang 70 quruşan e.
Seneliği 200, 6 aylığı 120, 3 aylığı 70 kuruştur.
Haftada bir defa neşirolunur.
(Ji heftê carekî neşir dibe.)

**Têdeyî/Mûnderecat**

| Nivîs | Nivîskar | Ziman |
|---|---|---|
| Mevcûdîyet-î haziremiz[7] | Mehmed Mîhrî | Turkî |
| Ta negirî | Abdulwahîd | Turkî |
| Enba û ebma-î weten[8] | Seyîd Mehmed | Erebî |
| Tahiyyetû-l mahabbeti | Mehmed | Erebî |
| Wezîfa me çî ye? | Mehmed Şefîq | Kurdî |
| Edebîyat-ı kurdîye | M. M. | Kurdî-Turkî |
| Esas | M. M. | Turkî |
| Îrfan | M. M. | Turkî |
| Kurdistana bir seyahat | Ahmed Wehbî | Turkî |

Nushası 5 kuruştur./ Nusxa wê 5 quruşan e.
Necmî İstikbal Matbaası

## Kurdistan, hejmar: 3

[7] Şimdiki Mevcudiyetimiz. (n. w.)
[8] Yurtaşların Haberlerî. (n.w.)

Sala yekemîn/Birinci sene, 25 Şubat 1335/ 25ê Sibata 1919
Salek 200, 6 mang 120, 3 mang 70 quruşan e.
Seneliği 200, 6 aylığı 120, 3 aylığı 70 kuruştur.
Haftada bir defa neşirolunur.
(Ji heftê carekî neşir dibe.)

**Têdeyî/Mûnderecat**

| **Nivîs** | **Nivîskar** | **Ziman** |
|---|---|---|
| Mezaya ve istidad-ı fitretimiz[9] | Mehmed Mîhrî | Turkî |
| Kurdistan mecmuası münasebetiyle | Kemal Fewzî | Turkî |
| Kurdistana bir seyahat | Ahmed Wehbî | Turkî |
| İlerî (Atî gazetesine) | İzzet Melîh | Turkî |

Nushası 5 kuruştur./ Nusxa wê 5 Quruşan e.
Necmî İstikbal Matbaası

## Kurdistan, hejmar: 4

Sala yekemîn/Birinci sene, 15 Mart 1335/ 15ê Adara 1919
Salek 200, 6 mang 120, 3 mang 70 quruşan e.
Seneliği 200, 6 aylığı 120, 3 aylığı 70 kuruştur.
Haftada bir defa neşirolunur.
(Ji heftê carekî neşir dibe.)

**Têdeyî/Mûnderecat**

| **Nivîs** | **Nivîskar** | **Ziman** |
|---|---|---|
| Kurdistan ve Kürdler | Ahmed Arif | Turkî |
| Kürdler ve Kurdistan | Abdulwahid | Turkî |
| Bîdarî | E. Q. | Farisî |
| Arz-î şukran[10] | M. Mîhrî | Farisî |
| Edebîyat-î kurdîye | …. | Kurdî |
| Wezîfa me çî ye? | Mehmed Şefîq | Kurdî |
| Îqazûn-naîm we tehyicûl-l qaîm[11] | M. Mihrî | Erebî |
| Tahiyyetû-l mahabbeti | …. | Erebî |
| Esas | …. | Turkî |
| Seyahat | Ahmed Vehbî | Turkî |
| Îrfan | M. M. | Turkî |

Nusxa wê 5 Quruşan e./ Nushası 5 kuruştur.
Necmî İstikbal Matbaası

[9] Yaratılışımızdan gelen kabiliyet ve alışkanlıklarımız. (n.w.)
[10] Ev nivîs bi zimanê farisî hatiye nivîsandin û di nav de behsê musîbetên ku bi serê milletê kurd re derbasbûne dike û dibêje; ez hêvîdarim ku vê demê halê milletê kurd ber bi başî ve biçe. (n. w.)
[11] Yên di xew de hişyar bikin û yên hişyar jî çalak bikin (n.w.)

## Kurdistan, hejmar: 5

Sala yekemîn/Birinci sene, 3 Nisan1335/ 3yê Nîsana 1919
Salek 200, 6 mang 120, 3 mang 70 quruşan e.
Seneliği 200, 6 aylığı 120, 3 aylığı 70 kuruştur.
Siyasî, ictimai, edebi ve ilmi olarak haftada bir defa neşrolunur.
(Sîyasî, civakî, edebî û îlmî ye, ji hefteyê carekî tête neşirkirin.)

**Têdeyî/Mûnderecat**

| **Nivîs** | **Nivîskar** | **Ziman** |
|---|---|---|
| Dahîliye nazırı hazretlerine | Mehmed | Turkî |
| Mazgirten telgraf | Yusuf | Turkî |
| Mamuret-ûl Azizden telgraf | Arif | Turkî |
| Diyarbekirden telgraf | Dr. Fuad | Turkî |
| Tarihten bir sayıfa | Sabri Suleyman | Turkî |
| Havadîs-î dâhiliye | - | Turkî |
| Havadîs-î hariciye | - | Turkî |
| Viranşehirden telgraf | Alî (Milli aşireti) | Turkî |
| Hûlyaperverane teşşebüsat | Mehmed Osman | Turkî |
| Hasbihal digel weten | Qadîzade M. Şewqî | Kurdî |

Nushası 5 kuruştur./ Nusxa wê 5 quruşan e.
Necmî İstikbal Matbaası

## Kurdistan, hejmar: 6

Sala yekemîn/Birinci sene, 22 Nisan1335/ 22yê Nîsana 1919
Salek 200, 6 mang 120, 3 mang 70 quruşan e.
Seneliği 200, 6 aylığı 120, 3 aylığı 70 kuruştur.
Siyasî, ictimai, edebi ve ilmi olarak haftada bir defa neşrolunur.
(Sîyasî, civakî, edebî û îlmî ye, ji hefteyê carekî tête neşirkirin.)

**Têdeyî/Mûnderecat**

| **Nivîs** | **Nivîskar** | **Ziman** |
|---|---|---|
| Tetîmme-î bîdarî | E.Q. | Farisî |
| Protesto | Kurdistan | Turkî |
| Kürdlerde efkar-ı umumiye[12] | Îbn el Reşid | Turkî |
| Desatîr-î asara karşı Kurdistan[13] | Lawê Delal | Turkî |
| Kurd muhacirleri ne olacak? | Mehmed Osman | Turkî |
| Kurdistan ve Kurdler | Ahmed Arîf | Turkî |
| Ermenistanın payitahtı ve kuvay-î askeriyesi | Cano | Turkî |
| Kurdistanın vaziyeti hariciye ve dahiliyesi | S. H. | Turkî |

[12] Kürdlerde genel fikirler (n. w.)
[13] Asrın yasalarına karşı Kurdistan. (n.w.)

| | | |
|---|---|---|
| Xîret bikin | Nûrsî | Kurdî |
| Le bo hewlî matemdar | M Şewqî | Kurdî |
| Edebiyat-ı Kurdiden bazı nûmuneler | M. M. | Turkî |
| Delalîya zarokan | Zeyno[14] | Kurdî |
| Şûunat | Kurdistan | Turkî |
| Şerif Paşa hazretlerinin beyanatı | İkdam[15] | Turkî |

Nushası 5 kuruştur./ Nusxa wê 5 qiruşan e.
Necmî İstikbal Matbaası

## Kurdistan, hejmar: 8

Sala yekemîn/Birinci sene 2 Mayıs1335/ 2yê Gulana 1919
Salek 200, 6 mang 120, 3 mang 70 quruşan e.
Seneliği 200, 6 aylığı 120, 3 aylığı 70 kuruştur.
Siyasî, ictimai, edebi ve ilmi haftalık ve müstakil fikir mecmuasıdır.
(Kovareke fikrî û serbixwe ya sîyasî, civakî, edebî û îlmî ye, ji hefteyê carekî tête neşirkirin.)

**Têdeyî/Mûnderecat**

| **Nivîs** | **Nivîskar** | **Ziman** |
|---|---|---|
| Mr Arthur Pot Wood Hazretlerine fûzuli cevap | Mehmed Mihri | Turkî |
| Vaziyet-i umumiyey-î ekrade bir nazar[16] | Îbn el Reşid | Turkî |
| Aîle-î Akvam (Milletler Cemiyeti) | Lawê Delal | Turkî |
| Kurdlük ve Kurdistanı yaşatabilmek | Mehmed Osman | Turkî |
| Kurd Hêvî Talebe Cemiyeti'nin ihyası | Tewfik H. | Turkî |
| Günül isterki! | Abdulwahid | Turkî |
| Bir Hakikati Tenvir | M. Selîm Begî | Turkî |
| Bismiki Sübhanehu[17] | Mehmed Şefiq | Erebî |
| Ey gelî kurdan | M. Yamulkîzade | Kurdî |
| Şîna Mela Hemze xwedê bihêlî | Kake Heme | Kurdî |
| Şûunat: Şerîf Paşa Hazretlerinin telgrafı | Kurdistan | Turkî |

Nusxa wê 5 Quruşan e/ Nushası 5 kuruştur
Necmî İstikbal Matbaası

[14] Di nav rûpelên hejmarên berdest ên *Kurdistan*ê de, wek nivîskara jin tenê navê Zeyno derbas dibe û di binê nivîsê de hatîye lêkirin "Ji eşîreta Mîran Zeyno", wekî din der barê nivîskar de agadarî nehatîye dayin.

[15] *İkdam*: Ev rojname yek ji rojnameyên rojane yê herî girîng ê dema Osmanîyan e û çepkirina wî di dema Cumhurîyetê de jî dewam kirîye. Xwedî û sernivîskarê wê Ahmed Cevdet bû. Rojnameya *Îkdam*, li bajarê Îstenbulê di 5ê Temmûza 1894an de dest bi weşanê kirîye û hetanî 31ê Kanûna 1928an dewam kirîye.

[16] Kürdlerin genel vaziyetlerine bir bakış".(n. w.)

[17] "Allahın Adıyla" (n. w.)

**Kurdistan, hejmar: 9**

Sala yekemîn/Birinci sene, 11Heziran1335/ 11yê Hezîrana 1919
Salek 200, 6 mang 120, 3 mang 70 quruşan e.
Seneliği 200, 6 aylığı 120, 3 aylığı 70 kuruştur.
Siyasî, ictimai, edebi ve ilmi haftalık ve müstakil fikir mecmuasıdır.
(Kovareke fikrî û serbixwe ya sîyasî, civakî, edebî û îlmî ye, ji hefteyê carekî tête neşirkirin.)

| | **Têdeyî/Mûnderecat** | |
|---|---|---|
| **Nivîs** | **Nivîskar** | **Ziman** |
| Mr Arthur Pot Wood Hazretlerine fûzulî cevap | M. M. | Turkî |
| Bir cevap | Kemal Fewzî | Turkî |
| Ermeni muhturasına mukabil Kürd muhtırası | Şerif Paşa Haz. | Turkî |
| Bedbaht Kurdistan | Emîn Fewzî | Turkî |
| Tarih | A. E | Turkî |
| Vîna weten | Şêx Suleyman | Kurdî |
| Ciwanan | M. Şewqî | Kurdî |
| Beyannama Hêvî | K. S. | Kurdî |
| Şûunatû mûxaberat | Kurdistan | Kurdî |

Nushası 5 kuruştur./ Nusxa wê 5 quruşan e.
Necmî İstikbal Matbaası
Dağıtım yeri:
İstanbulda Bab-ı Alî caddesinde “Yeni Şark” Kütüphanesidir.

**Kurdistan, hejmar: 13**

Sala yekemîn/Birinci sene, 31Ağustos1335/1919
Salek 200, 6 mang 120, 3 mang 70 quruşan e.
Seneliği 200, 6 aylığı 120, 3 aylığı 70 kuruştur.
Siyasî, ictimai, edebi ve ilmi haftalık ve müstakil fikir mecmuasıdır.
(Kovareke fikrî û serbixwe ya sîyasî, civakî, edebî û îlmî ye, ji hefteyê carekî tête neşirkirin.)

| | **Têdeyî/Mûnderecat** | |
|---|---|---|
| **Nivîs** | **Nivîskar** | **Ziman** |
| Oryent News gazetesine | Kake Heme | Turkî |
| Bedbaht Kurdistan | Emin Feyzî | Turkî |
| Amerika Tahkik Heyet-i Reisi | | |
| Mister Qarayin cenablarına | Hûrmûz Yadî | Turkî |
| Türk ve Kürd meselesi | Cano | Turkî |
| Haşim Nahid Beg’e | Kuyseyî | Turkî |
| Nafia Nazır-ı Esbuki Ferid Beg’e | Kake Ezîz | Turkî |
| Tehiyetu’l-muhabbe | Mîhrî | Erebî |
| Şuûnat-ı yewmiye | Kurdistan | Turkî |